# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (144):

## Gundên "Senarê û Anqelê û Aşkê Xerbî" di bin binpêkirin û tewanan de, dizîna pêz û dewêr û ferzkirina vêrgiyên nû, pevçûn û teqandin


قصف قرية "سناره" أثناء العدوان التركي على عفرين، الربع الأول ٢٠١٨م.




منزل المغترب "محمد رشيد" المدمر في قرية "سناره".


ضريح المرحوم "شيخ محمد علي آغا" في مقبرة "آنقله/سناره" قبل التدمير.


"معسكر القادسية"- لواء الوقاص بين حرش جبل بيرقدارالمطل على قرية "مروانية".





تفجير سيارة بحي المحمودية- مدينة عفرين، ٥ أيار ٢٠٢١م.

Heyva Rojiyê ya pîroz ji nandozên Turkiyê yên bi Kiwalisyona Sûrî - Ixwanî ve girêdiyî re nebû kend û rêgir, û binpêkirin û tewanên ku di dermafê herêmê û xelkê wê de têne kirin sivik nekir. Belê wan bi heman pileyê û li ber roniya fetwên şêxên xwe ew kiryarên qirêj berdewam kirin; Emê ji wan van bi bîr wînin:

**= Gundên "Anqelê û Senarê":**

Herdu gund bi hev ve ne, girêdayî Navça Şiyê ne, li Ro'avyê Bajarê Efrînê dikevin û dora /40/KM jê ve dûr in, ji dora /500/mal pêk tên, dora /2000/nişteciyên resen ên Kurd tê de bûn, tenê piştî dagîrkeriyê dora /750/nişte ji wan man, dora /1150/nişte ji anîndeyan lê hatin niştecîkirin; Di dema talankirinê de /7/ mal li herdu gundan bi tevahî hatin roxandin û /4/jî bi piçekî; Milîseyên "Lîwa'i Elweqas" (ya ku herdu gundan desteser dike) mala hemwelatî "Ebdîn Bekir" li Gundê "Anqelê" û herweha mala hemwelatî "Menan Şêxo" li Gundê "Senarê" (yên bi zorê hatine koçberkirin) ji xwe re kirine birayargehên leşkerî, herdu avahiyên şaredariyê û dermankiringehê ji anîndeyan re kirine niştecîgeh, û leşkergeheke wê bi navê "Elqadisiyê" li Çiyayê "Bêriqdêr" (a li hafa Gundê "Merwaniyê" yê hevcîwar) heye.

**Wê milîsê ji herdu gundan ev tişt dizîn:**

Tevahiya kelûpelên hundir malan ji xwarinvexwarinê de bigir ta alav û amûrên elektirîkê û firaxên baqirî û raxistek û yên bilî wan; Kebil û guheztekên (tislranslêtor) toreya Elektirîkê ya giştî; Keblên toreya telîfona

zemînî; Kebil û amûrên toreya entirnêtê yên hemwelatî "Hec Mihemed Hisên Axa"; Du giropên zaynda elektirîkê (elektirîkzê, cênîrêtor's) yên taybet (Ampêr); Giropa hilkişandina ava vexwarinê ya giştî; Piraniya jimarekên ava malan; /15/giropên taybet ên hilkaşandina ava avdanê yê çandiniyê; /13/tirektor û /8/maşîne; Tevahiya acetên guvêşgeha zeytûna ya hemwelatî "Hec Mihemed Hisên Axa"; Tevahiya aletên nanpêjgeha otomatîk a hemwelatî "Xalêd Reşo" ji Bajaroka Şiyê.

Herweha jî dest danî ser malmewdanên hemwelatiyên koçber û yên bi zorê hatine koçberkirin, jê:

Tîmargeha mirîşkan a hemwelatî "Şukrî Mistefa Ebdo"; Dora /20/hezar darên zeytûnê li Gundê "Anqelê" û hin ji wan ên van hemwelatiyan in (Şukrî û Nîhad û Xelîl û Mihemed Elî Şêx Zero, herdu dilovanber Mistefa û Mihemed Şêx Zero, Mihemed Reşo, Ferîd Mihemed Mistefa, Bekir Mihemed Bekir); Dora /30/hezar darên zeytûnê li Gundê "Senarê" û hin jê yên van hemwelatiyan in (Mihemed Hisên Mistefa Axa, Menan Şêxo, Elî Sebrî, Ezet û Xalêd Osman Nebî, du hezar dar ên hemwelatî Beşîr Mistefa Xoce - bi ser ku hevjîna wî li gund e û /20/hezar dolar vêrgî jî dayiye wan).

Û bi ser de jî van vêrgiyan li ser hemwelatiyên herdu gundan ferz dike:

15% ji berhema werzên zeytûna û tibabine din bi awakî tewşankî ji parên zeyta hemwelatiyan (ên li guvêşgehan) bi zorê dibe, û ji du heyvan ve /700/teneke zêt ji xelkê Gundê "Anqelê" û /400/jî ji xelkê Gundê "Senarê" standiye; Dolarekê li ser her tenekak zeyta zetûna (e ku ji herdu gundan derdikeve) werdigre; /50/ Pereyên Tirkî her şeş heyvan li ser her seriyekî pêz û dewêr ( yên ku hejamar dighêje dora/750/serî) distîne (yanê her şeş heyvan dora /37500/PT); Weha jî /1.5/PT li ser her miharak an tûrek werza keskahiyê û meywe û çiloyê reza distîne; Û berê jî xwediyên sê guvêşgehên zeytûna -dema ku vegerîne cî û warên xwe- vêrgiyên bilind dane, da ku acet û aletên wan neyêne dizîn.

Li dema talana Avdara 2018an milîseyan û bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê gorna zaretgeha "Elî Dede" ya Islamî kolandin û roxandin, kortek bi ferehiya /30/M û kûraniya /5/ metran ji bo lêgerîna li şopeweran û dizîna wan di orta goristana dîrokî ya herdu gundan de vekirin, û bi behaneya avakirina bargeheke leşkerî (ya ku paşê cîbecî nebûye) dora /300/ gor ji holê hate rakirin (jê: Gorgeha "Şêx Mihemed Elî Axa" ya ku dîroka wê bêtirî /150/sal e ), û ji ber wê bermayên cendekên hin miriyan jî bi ser rûyê erdê ketin. Û li Havîna 2019an Girê "Cirnazê" (yê kevneşopî yê li Ro'vayê herdu gundan dikeve) hate kolandin û rêşkirin, jê peykereke gaya ye mezin û kinzên veşartî hatin dizîn, û her weha jî li nav zeviyên zeytûna li Ro'ava û Başûrê "Anqelê" jî kolandin.

Hemwelatiyên herdu gundan wekî ku di leşkergehan de bin dijîn, Milîseyên "Elweqas" bi behaneya parastina jiyana sivîlan, bê rêdanên fermî(rojane yan heftane yan heyvane ji kesan re, û herweha jî ji bo tirektor û makînan sê heyvan) û ji nivîsgeha wê ya ewlehiyê ve morkirî, rê nadin wan ku ji gund derkevin an têkevinê; Herweha bi dehan ji wan rastî cûrbecûr tengasîkirin û binpêkirin û tewanan hatin û li rex wê jî işkencekirin û ferzkirina vêrgiyên diravî li ser wan, li ser xelkê herdu gundan hate ferzkirin ku tenê ava vexwarinê (her sîtêrek ji /3300/litir bi /15/hezar PS) ji bîra ku "Lîwa'i Elweqas" bi kar tîne bikirin; Qedexe kirin ku êzing derkevin derveyî gund û tenê kirînfirotin di nûnerên "Elweqas" de dorpêç kirin; Dora /120/darên zeytûnê yên hemwelatî "Elî Sebrî" li Gundê "Senarê" ji kokê ve qut kirin. Weha jî cotarî neçar dibin ku giropên hilkişandina ava avdanê yên têne guhestin bi kar wînin da ku neyêne dizîn, û hin ji wan jî, da ku heyînên xwe biparêzin cekdatan dikin ortaqê xwe.

Û li roja nehê ji êrişkeriyê 29.1.2018an, hemwelatiyê temenmezin "Arêf Ezîz Elo" ji Gundê "Senarê" di bin bermayên mala xwe de (ya bi topebaranê hatiye roxandin) şehîd ket.

Bi ser de jî hînkirin di herdu gundan de lawaz e, û dibistana amedeyî ya hevbeş di navêna wan de ji holê hate rakirin.

Û divê were zanîn ku berpirsê ewlehiya "Lîwa'i Elweqas - Hûsam Heyanî Ebû Reşîd" di maleke hemwelatiyekî Gundê "Merwaniyê" de rûdine, û "Îmad" birayê serkêşê "Elweqas" (yê ku xwe weke kesekî sivîl dide nasîn) piroseyên dizîn û talan û şopandina ewlekariyê û hemî binpêkirin û tewanên din dide hevrêzkirin.

**= Gundê "Aşkê Xerbî":**

/7/KM ji navenda Bajarê Cindirêsê dûr dikeve û bi rêvebiriya wê ve girêdayî ye, ji dora /300/mal pêk tê, dora /1500/ nişteciyên wê yên resen hebûn, ji ber koçberkirina zorane tenê /450/nişte jê man, û dora /300/nişte ji anîndeyan tê de û di hin çadiran de hatin niştecîkirin. Milîseyên "Lîwa'i Elweqas" (ya ku "Ebû Îmad" li gund serkêşiya wê dike) ew desteser kir, mala hemwelatî "Mihemed Heyder Mile" ji xwe re kir biryargeheke leşkerî, li dema êrişkeriyê kelûpelên hindir piraniya malan ji xwarinvexwarinê de ta firaxên

baqirî û qizîzî û amûrên taqeta royê ya elektirîkê û her wekî din û tevahiya amûr û keblên toreyên elektirîkê û telîfona zemînî yên giştî dizîn, Kelûpelên du malan jî bi tevayî şewitandin, û herweha/3/tirektorên çandiniyê yên van hemwelatiyan (Behrî Necar, Mistefa Oso, Şahîn Elûş) û du matorên du tekerî û /50/ berx ên hemwelatî "Edanan Mamo" jî dizîn. Weha jî dest danîn ser dora /5/hezar darên zeytûnê yên hemwelatiyên bi zorê hatine koçberkirin, û yên li gund mane rastî gelek fişaran hatin, yek jê: Dora /50/ kesî ji xelkê gund -hin ji wan jî li Tirkiyê diman- bi behaneya têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re hatin girtin, û bi hepiskirin û baceyên cûrbecûr hatin sezakirin.

15% vêrgî li berhema werza zeytûna û bi behaneyên têkel li ser her malekê dora /300-2500/dolar ferz kir; Dora /30%/ ji hirşên Çiyayê "Bêriqdêr" (ya li hafa gund) qut kirin, kirînfirotina êzingan tenê di nûnerên xwe de -bi buhayê ku ew dîdine- dorpêç kir.

**= Binpêkirinên din:**

**-** Li 29.4.2021an dema ku hemwelatiyê temenmezin "Îse Hisên Ferec" ji xelkê Gundê "Meyasê" - Navça Şêrewa ( yê ku di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de) li Ro'avayê gund û li nêzîk taximên Gundê "Kîmarê" - Navça Şêrewa pezê xwe diçêrand, Milîseyên "Hêzên Taybet - Feyleq Elşam" (ya ku herdu gundan desteser dike) pezê wî /107/ serî jê standin û bi awakî mekin lêxistin, û di encamê de kete nivînan; Herweha jî berî heftakê, bi behaneya çêrandina pêz li Rohilatê gund ( aliyê bi destesriya Artêşa Sûriyê re sînordar), /14/berx ji hin hemwelatiyên Gundê "Kîmarê" (Ezîz Îbo, Nîdal Hiso Hisên, Sibhî Hisên, Hemo Xelîl Mihemed) bi darê zorê birin û du rojan ew revandin û işkence kirin.

**-** Serkêşê Milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah - Mihemed Elcasêm Ebû Emşe" -weke salên berê- 15% vêrgî li ser berhema werza çiloyê tirî li navenda Navça Şiyê û gundên di bin destlatiya wî de ferz dike.

**-** Li Şeva 6.5.2021an, giropeke çekdar ji Milîseyên "Lîwa'i Elmu'itesêm" avête ser mala hemwelatî "Zûhêr Me'imo kurê Isma'îl /55/sal" (ya ku li derdora Gundê "Kurzêlê" Navça Bilbilê dikeve), ew û hevjîn û bavê wî yê kalemêr girêdan û dev jî girtin, û malmewal û amûreke telîfonê û matoreke duloqî û zayndeke elektirîkê (elektirîkzê, cinîrêtor) û tiştmiştin malê dizîn; Û li roja din piştî ku nûçe di ragîhandinê de belav bû, wê milîseyê di amûrên telîfonên merivên "Zûhêr" de geriya da ku zanibe ka kê bûyer belav kiriye.

**= Fewdalîzim û serberdayetî:**

**-** Li 4.5.2021an, di dema belavkirina "pateta" de -weke alîkarî- li Gundê "Dumiliya" - Navça Reco, di navêna du giropên çekdar ji Milîseyên "Lîwa'i 112" de pevçûnina rûdan, xelk tirsiya û çar endam bi awayên têkel birîndar bûn û yek jê jî di rewşeke metirsîdar de ye. Û ji bo kontorolkirina rewşê û da ku pevçûn neyê nûkirin, "Asayişa Leşkerî" di herdu derbasgehên "Be'idîna û Dumiliya" de rêbend çêkirin.

**-** Li 5.5.2021an, li Taxa Mehmûdiyê ya Bajarê Efrînê maşînak "Sentefê" hate teqandin -di karnava heyv û nîvekê de ev cara çarê ye- û di encamê de mêrek û pênc zarok ji yek malbatê birîndar ketin.

Rewşên bed û pîs ên li Efrînê serwerbûyî, siyasetên Turkiyê û aliyên pêve girêdayî (yên li dijberî Kurdan û hêzên wan ên niştîmanî) riswa dike û dicersîne, û heyîn û rasteqînên ku em belge dikin tenê beşek in ji wan qirêjiyên têne kirin; Ev bi xwe jî viyana gelê me (ya ji bo berevaniya di ber hebûn û doza wî ya dîrokî û dadmend de) mekin dike.

09.05.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Topebarana Gundê "Senarê" di dema êrişkeriyê de, çarêka yekê ji sala 2018an.
- Pakrewan "Arêf Ezîz Elo" - Gundê "Senarê".
- Mala biyanber "Mihemed Reşîd" ya wêranbûyî li Gundê "Senarê".
- Gora dilovanber "Şêx Mihemed Elî Axa" li goristana "Anqelê û Senarê" li berî wêrankirinê.
- Leşkergeha "Elqadisiyê" - Lîwa'i Elweqas di nav hirşê Çiyayê "Bêriqdêr" de ya bi ser Gundê "Merwaniyê" ve.
- Gundê "Aşkê Xerbî" û hirşên bi ser ve li berî dagîrkeriyê.
- Teqandina maşînakê li Taxa Mehmûdiyê - Bajarê Efrînê, 5.5.2021an Z.